## Jana ziravê çiye?

**Jana ziravê nexweşiyeke cidî û jêkvegir e û ji rûyê bakteriyê çêdibe.**

Kifşkirina (venasîna) zû û tedaviya kamil ji bo sediqandina başbûna lezgîn girîng in.

Jana ziravê dikare êrişî gelek organên laşê mirovan bike. Herî zêde ew li ser kezebê bandor dide.

Lê belê, ew dikare organên li beşên din weke girêkên limfê, gurçikê, movikan,situnka piştê û rêzika demarî ya navendî jî ji xwe re hedef bigre.




Literaturverzeichnis:

– Bayerisches Landesamt für Gesundheit und Lebensmittelsicherheit. Erlangen. Tuberkulose. 2016. ( www.lgl.bayern.de/gesundheit/infektionsschutz/infektionskrankheiten_a_z/tuberkulose/ )

– Bundeszentrale für gesundheitliche Aufklärung. Tuberkulose. Köln. 2016 ( www.infektionsschutz.de/erregersteckbriefe/tuberkulose/ )

– Robert-Koch-Institut. Berlin. 2016. Tuberkulose. ( www.rki.de/DE/Content/InfAZ/T/Tuberkulose/Tuberkulose.html )



Bayern.
Die Zukunft.

BAYERN DIREKT ist Ihr direkter Draht zur Bayerischen Staatsregierung.

Unter Telefon 089 122220 oder per E-Mail unter direkt@bayern.de erhalten Sie Informationsmaterial, Broschüren, Auskunft zu aktuellen Themen und Internetquellen sowie Hinweise zu Behörden, zuständigen Stellen und Ansprechpartnern bei der Bayerischen Staatsregierung.



Herausgeber: Bayerisches Landesamt für Gesundheit und Lebensmittelsicherheit
Eggenreuther Weg 43, 91058 Erlangen
Internet: www.lgl.bayern.de
E-Mail: poststelle@lgl.bayern.de
Telefon: 09131 6808-0
Telefax: 09131 6808-2102

Bildnachweis: panthermedia.net/Remains; thinkstock.com/mantosh; thinkstock.com/didesign021
Gestaltung: CMS – Cross Media Solutions GmbH
Druck: Druckerei Schmerbeck, Tiefenbach
Stand: August 2017
Artikelnummer: stmgp_gesund_066


© LGL, alle Rechte vorbehalten

Hinweis: Diese Druckschrift wird kostenlos im Rahmen der Öffentlichkeitsarbeit der Bayerischen Staatsregierung herausgegeben. Sie darf weder von den Parteien noch von Wahlwerbern oder Wahlhelfern im Zeitraum von fünf Monaten vor einer Wahl zum Zweck der Wahlwerbung verwendet werden. Dies gilt für Landtags-, Bundestags-, Kommunal- und Europawahlen. Missbräuchlich ist während dieser Zeit insbesondere die Verteilung auf Wahlveranstaltungen, an Informationsständen der Parteien sowie das Einlegen, Aufdrucken und Aufkleben parteipolitischer Informationen oder Werbemittel. Untersagt ist gleichfalls die Weitergabe an Dritte zum Zweck der Wahlwerbung. Auch ohne zeitlichen Bezug zu einer bevorstehenden Wahl darf die Druckschrift nicht in einer Weise verwendet werden, die als Parteinahme der Staatsregierung zugunsten einzelner politischer Gruppen verstanden werden könnte. Den Parteien ist es gestattet, die Druckschrift zur Unterrichtung ihrer eigenen Mitglieder zu verwenden. Bei publizistischer Verwertung – auch von Teilen – Angabe der Quelle und Übersendung eines Belegexemplars erbeten.
Das Werk ist urheberrechtlich geschützt. Alle Rechte sind vorbehalten. Die Broschüre wird kostenlos abgegeben, jede entgeltliche Weitergabe ist untersagt. Diese Broschüre wurde mit großer Sorgfalt zusammengestellt. Eine Gewähr für die Richtigkeit und Vollständigkeit kann dennoch nicht übernommen werden. Für die Inhalte fremder Internetangebote sind wir nicht verantwortlich.



Bayerisches Landesamt für
Gesundheit und Lebensmittelsicherheit




# Jana ziravê

## Kişfkirina di wextê de xwe û tedavî

**Zanyarî ji Dezgeha Tendirustiya Gelemperî ya we**

**Kurdî Kurmancî/Kurdisch Kurmanji**


LGL
www.lgl.bayern.de

## Berjengên mumkin çine?

- Kuxika zarzar, carna bi tifa tijjî xwîn re
- Êş dema hilm kişandinê
- Westan û mandîbûn
- Sincar
- Lawaz bûna nexwestî
- Xwêdana şevê
- Girêkên limfê yên mezin

## Kî bi taybetî di xeterê de ye?

- Bebek û zarokên biçûk
- Kesên ku pergala wan ya bexşangê lawaz e, weke mînak ji ber nexweşiyên kronîk ( nexweşiyên tumorê, HIV) an bedxwerî.
- Kesên ku li hawirdora wan ya nêzik nexweşên jana ziravê heb in ( mînak: malbat, heval)
- Koçberên ji başûrê Efriqayê, Rojhilata Ewrupayê û navenda Asyayê.
- Kesên ku wextê xwe di welatekî de ku jana ziravê ji Elmanya'yê zêdetir belav bûbe derbas kiribe.
- Kesên ku berê tekiliya wan bi jana ziravê re çêbûbe.



## Jana ziravê çewa diguhizê?

Kesên ku jana zirava ya kezebê ya vekirî bi wan re heye ji ber ku bakteriyê bi rêya kuxik û pişkinînê derdixin derbasî derudora xwe jî dikin. Mirovên din dikarin peşkokên ku di navê de bakterî hene bikşînin hilma xwe û bi vî awayî bi nexweşî re peywendî bigrin. Enfeksiyon girêdayî dem û xurtbûna vê peywendiyê ye. Jana ziravê ya ku bandor li ser kezebê neke di rêyên peywendiyên normal derbasî kesên din nabe.

## Têkiliya di navbera enfeksiyon û diyarbûna nexweşiyê çiye?

Hemû kesên ku bakteriya jana ziravê bigrin nexweş nakevin. Ji ber ku pergala bexşangê piştî ku patojenên jana ziravê dikeve nav laş wan kontrol dike gelek caran nexweşî diyar nabe. Ji ber vê yekê tenê derûdora deh ji sêdî piştî ku bakterî dikeve laşê wan di nava du salan de nexweş dikevin. Lê belê girêdayî temen û rewşa pergala bexşangê ya wan kesan, newxeşî dikare piştî çend mehan jî û piştî dehan sal jî xwe diyar bike.

## Nexweşî çewa tê teşxîskirin?

Kesên ku berjengên jana ziravê bi wan re hebe *pêwistiya wan* bi şêwirdariya tendirustî ya lezgîn û muayeneyê heye.

Dibe ku rontgena kezeban ji bo nasîna jana ziravê alîkar be. Awayên din testa xwînê û testa çerm e. Lê venasîna berçav tenê bi rêya kifşkirina bakteriya jana ziravê di malzemeyeke minasib ya lêgerînê mumkin e (mînak: tif).

## Jana ziravê çewa tê derman kirin?

Ji bo derman kirina jana ziravê tedaviyeke bibandor heye. Eger teedavî bi têra xwe dirêj berdewam bike û derman bi awayekî rêkûpêk bên sitendin ev nexweşî di pirrî rewşan de tê çareserkirin.

## Ez dikarim ji kuderê alîkarî bigrim?

Eger hun guman dikin ku têkiliya we bi jana ziravê re çêbûye ji kerema xwe bi bijîşkê xwe re peywendî bikin. Dezgeha Tendirustiya Gelemperî ya herêmî ya we şêwirdariya belaş pêşkeş dike.

**Zanyariya bêtir li ser înternetê heye:**

- Robert Koch Institute: www.rki.de/tuberkulose
- Ofîsa Dewletî ya Bavarian'ê li ser Tendirusti û Ewlehiya Xwarinê LGL: www.lgl.bayern.de/gesundheit/infektionsschutz/infektionskrankheiten_a_z/tuberkulose/
- Desteya Navendî ya Elmanya'yê Dijî Jana Ziravê (DZK): www.dzk-tuberkulose.de
- Ravekirina jana ziravê li ser înternetê: Zanyariya li ser jana ziravê lji bo smartfonan: www.explaintb.org